

Plana kursê ya swêdî ji bo bîyanîyan

Armanca perwerdê

Perwerdeya swêdî ji bo bîyanîyan perwerdeyêke zimên ya têrzane ye û armanca wê ew e ku zanyariyên bingehîn yê swêdî bide bîyanîyên salmezî. Xwendevanekî ku zimanê wî yê zikmakî ne swêdî ye di vê perwerdê de wê xwe hînî pêşxistina zimanekî duyem yê fonksiyonel bike. Perwerde wê pêdiviyên zimanî ji bo danûstandin û beşdarîyê çalak ya civaka rojane, jîyana kar û xwendina berdewamî bide. Armançek din ya perwerdê ew e ku imkana fêrbûnê bide bîyanîyên salmezî ku bingehê xwendin û nivîsandina wan tune. Şagirtêk nexwende yan ku ji bilî alfabe ya latînî sistemek din ya nivîsandinê bi kar tîne dê di çarçoveya perwerdê de dersên xwendin û nivîsandinê bibîne.

Perwerde berê xwe dide kesên ku tecrûbe, rewşa jîyanê, zanîn û armancên wan yê xwendinê ji hev cuda ne. Ders bi şagirt re tê pilankirin û şikildan. Ew li gor hewes, tecrûbe, zanyariyên piralî û armancên demdirêj yê şagirt tê guncandin.

Niqteya hereketê ya perwerdê pêdiviyên mirovî ne. Ew bi karê bimeaş û xebatên din wek rênasîna jîyana kar û civakî, çiraxî, pratîk û perwerdeyên din re tê kombînekirin. Lewra ji aliyê dem, cî, naverok û awayên kar de divê şeweyê wê heta ji dest tê ders guherbar be.

Armanc û taybetmendiyên perwerdê

Armanc bi perwerda swêdî ji bo bîyanîyan ew e ku van aliyên şagirt pêş de bibe:

- şiyana xwendin û nivîsandina swêdî,
- şiyana axavtin, guftûgokirin, xwendin, guhdarîkirin û têgihîştina swêdî di têkilîyên cuda de,
- şiyana guncandina zimên li gor wergir û rewşan,
- bilêvkirinek baş,
- têgihîştina bê mirov çawa ziman fêr dibe,
- stratejiyên fêrbûn û danûstandinê ji bo bi berdewamî pêşdebirina zimanê xwe.
- şiyana bikaranîna teknîka dijîtal û alavên pêwendîdar yê ji bo fêrbûn û danûstandinê, û her weha
- şayîna hayedariya li beramberî agahiyên ji çavkanîyên cuda.

Karakterê perwerda swêdî ji bo bîyanîyan ew e ku xwendevan şiyana xwe ya zimanê danûstandinê pêş de bibe. Ev jî tê wê wateyê ku hem devkî, hem nivîskî li gor pêwistiyên xwe mirov bikaribe bide û bistîne. Divê şagirt zanîn û şiyanebî curbecur bigire da ku zimanê xwe li gor rewşa di nav de adapte bike. Şiyana zimên ya ragihandinê kompetensên cuda ku bi hev re têkildar in û hev temam dikin dihewîne nav xwe. Loma şiyana zimanê ragihandinê hem sistema zimanekî hem jî zanyariyên bê ew sistem çawa tê bikaranîn ferz dike.

Perwerde, divê derfetan bide şagird ku ji bo pêşxistina zanîn û şiyanebî xwe yê cuda li gorî rewşeke danûstandinê ya rojane, hîlbijartinên zimên yê pêwendîdar bike. Zanînen sistema zimên tê wateya gotin, biwêj, bilêvkirin û binyata rêzimanî. Ji aliyê din ve zanîna bikaranîna zimên tê wateya bê mirov çawa nivîsekê ava dike û zimên li gor rewş, wergir û mebestê diguncîne. Kompetensek girîng ew e ku mirov bikanibe stratejî û medyayên cuda bi kar bîne da ku bi awayê herî bitesîr bigihîje mebesta xwe.

Di perwerdeyê de divê şagird bi nivîsên cuda re rûbirû be ku di nav wan de peyv, wêne û deng hem bi û hem jî bê alavên dijîtalî di nav ahengekê de bi hev re didin û distînin. Perwerde divê rê veke ku şagirt hişyariya xwe ya li ser bê fêrbûna zimên bi çî rengî dibe û famkirina fêrbûna xwe bi xwe pêş de bibe. Şagirt

herwiha bi rêya hizirîna li tecrûbeyên xwe yê çandî, kompetensa xwe ya pirçandî pêş têxe û wan bi bûyerên rojane yê civakî û jîyana kar li Swêdê re dide ber hev.

Perwerde divê rê veke ku şagirt zanîna xwe ya bikaranîna alav û amûrên dijîtal, alav û medyayên pêwendîdar ji bo agahîgirtin, ragihandin û fêrbûnê pêş bêxe.

Bi rêya perwerdeya fêrbûna xwendin û nivîsandina bingehî divê ev derfet ji şagird re bêne dayîn

- pêşxistina famkirina xwe ya ka nivîs bi çi awayî peyama radigihîne û ka zimên çawa hatiye afrandin
- pêşxistina şayîna xwe ya ji bo bikaranîna zimên di rewşên cuda de
- bikaranîna qaîdeyên herî asayî yê ji bo zimanê nivîskî
- bikaranîna xwendin û nivîsandinê ji bo fêrbûn, famkirin û îfadekirina xwe
- hayedarbûna ka meriv zimên çawa fêr dibe
- pêşxistina çend stratejîyên hêsan yê xwendin û nivîsandina ji bo armancên cuda, û
- bikaranîna teknîka dijîtal û alavên pêwendîdar yê ji bo fêrbûna xwendin û nivîsandinê.

Struktura perwerdê

Perwerdeya zimanê swêdî ji bo bîyanîyan ji dereceyên xwendinê, 1, 2 û 3 û ji çar kursên cuda, A, B, C û D, pêk tê. Dereceya xwendinê ya 1:ê ji kursên A, B, C û D, dereceya 2:ê ji kursên B, C û D dereceya 3:ê ji kursên C û D pêk tên. Ew dereceyên xwendinê yê cuda berê xwe didin kesên bi paşxane, şert û armancên cuda. Ev dereceyên xwendinê nîşan dide ka kîjin kursa destpêkî û tempoya pêşveçûnê minasib e. Şagirdê di wê dereceya xwendin û kursê de dest bi perwerdeya xwe dike ku ji bo şertên wî/wê yê şexsî herî minasib e. Mercên zanîne yê kursekê ji bo hemû dereceyên xwendinê wekî hev e.

Dereceya 1:ê bi taybetî berê xwe dide wan kesên bi xwendina pir kêr e û dereceya 3:ê ji bo wan kesan e ku xwedîye tecrûbeya xwendinê ne.

Nirxandina ka kîjin dereceya xwendinê ji bo şagirdê herî minasibe e û divê bi kîjin ji kursên dereceya xwendinê dest pê bike pêwîst e, li ser bingehê zanebûn, şert û tiştên din yê ji bo derfetên biciyanîna mercan lazim in, bi awayeke sîstematîk were pêşdarî kirin.

Şikildana kursên wan her sê dereceyên xwendinê li gorî tecrûbeya fêrbûnê, paşaxana perwerdeyê û asta zanîna swêdî bi awayên cuda tê kirin.

Şagirdê dikare piştî her yek ji van kursan perwerdeya zimanê swêdî ji bo bîyanîyan bidawî bike. Lê divê derfet ji her şagirdî re bê dayîn ku hetanî kursa D ya dereceya xwendina xwe perwerdeya xwe bidomîne. Ev divê bi wê guncadina tê daxwazkirin bê kirin da ku şagird mercên zanebûnê bi cî bîne.

Fêrkirina xwendin û nivîsandinê ya bingehî

Perwerdeya ku bi mebesta fêrkirina xwendin û nivîsandinê ye ji bo kesên ku berê perwerdeya wan nîne, kêr e yan jî ji hêla fonksiyonî ve xwendin û nivîsîna wan tune ye. Di perwerdeya zimanê swêdî ji bo bîyanîyan de bi taybetî bi dereceya xwendin 1 re imkan tê dayîn ku ew fêrî xwendin û nivîsandina bingehî bibin. Ev hûrûkûr pêdaketin û otomatkirina zanyarîyan dihewîne nav xwe. Heta mirov di bingehê de bibe xwendekê bifonksiyon demek dirêj dikare

derbas bibe.

Fêrkirina xwendin û nivîsandinê ya bingehî her weha di dereceya 2 û 3 de jî ji bo şagirdên xwende lê yê ku ne bi alfabeya latînî xwendine dikare lazim be. Hingê pêvajoya fêrkirinê bi rengêkî din e.

Fêrkirina xwendin û nivîsandinê ya bingehî ne bi kursên A-D ve nayê girêdan, ew beşeke bi serê xwe ye, ku dikare bi bi kursekê ve bê kombînekirin. Ev pêvajoyê heta ku xwendevan diçe perwerdeya zimanê swêdî ji bo bîyanîyan dikare dewam bike, ji bo ku meharet bê otomatkirin.

Perwerde dikare bi zimanê zikmakî yê xwendevan be yan jî bi zimanekî din be, ku şagird pê dizane

Nirxandin

Niqteya hereketê ya nirxandinê dê şîyana xwendevan ya bikaranîna zimanê swêdî di armancên cuda yê di jîyana rojane, civak, kar û xwendina berdewamî de bi awayekî ku bê famkirin be. Nirxandin divê zanînen şagirt li gor şertên notên A, B, C, D û E bipêve. Şertên zanîne li gor pênc beşên zanîne hatine danîn: famkirina bihîstinê, famkirina xwendinê, danûstandina devkî, xweîfadekirina devkî û şîyana nivîskî. Ev beşên zanîne bi serê xwe cuda nayên nirxandin. Mamoste divê nirxandinek giştî ya şîyana zimanê şagirt bike û binêre bê bi rastî şagirt zimên çiqas dizane. Nirxandina duristîya zimanî li gor naverok û tevahîya zimên tê kirin.

Li gorî qanûna dibistanan (20 kap. 35 § skollagen (2010:800)) divê piştî dawîbûna her kursekê not bê dayîn. Piştî kursên B, C û D îmtihanek dawî ya netewî tê. Di perwerda beşê fêrbûna nivîsandin û xwendinê de not nînin.

Şertên zanîne

Famkirina bihîstinê

Kurs A

Şagirt bi hin alîkarî gotinên zelal û hêsan yên di rewşên jîyana rojane de fam dike.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt gotinên giştî û biwêjên hêsan di bûyerên kurt yên rojane de ku pir tîn tekrarkirin fam dike. Ew herwiha agahiyên zelal û guncandî yên pêwîst fam dike.</p> <p>Şagirt direktîfên devkî yên hêsan û ku pir rûdidin fam dike û piraniya caran bi awayek bikêrhatî li gor wan tevdigere.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanîne yên ji bo E û beşek mezin ji C tîne çî.</p>	<p>Şagirt biwêjên hêsan û hevokan di bûyerên kurt yên rojane de ku pir tîn tekrarkirin fam dike. Ew herwiha agahiyên zelal û guncandî yên pêwîst fam dike.</p> <p>Şagirt direktîfên devkî yên hêsan û ku pir rûdidin fam dike û bi awayek bikêrhatî li gor wan tevdigere.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanîne yên ji bo C û beşek mezin ji A tîne çî.</p>	<p>Şagirt biwêj û hevokên hevgerî di bûyerên kurt yên rojane de ku pir tîn tekrarkirin fam dike. Ew herwiha agahiyên zelal û guncandî yên pêwîst fam dike.</p> <p>Şagirt direktîfên devkî yên hêsan û ku pir rûdidin fam dike û bi awayek baş li gor wan tevdigere.</p>

Kurs B

Şagirt axavtinên zelal û hêsan yên di rewşên asayî di jîyana rojane de fam dike.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt bûyer, guftûgo, agahî û nûçeyên adaptekirî yên li ser mijarên nas û kurt fam dike û dikare xulaseyek hêsan ji naveroka sereke derxîne.</p> <p>Şagirt peyama û direktîfên devkî yên hêsan û kurt ku di jîyana rojane de rûdidin fam dike û piraniya caran bi awayek bikêrhatî li gor wan tevdigere.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanîne yên ji bo E û beşek mezin ji C tîne çî.</p>	<p>Şagirt bûyer, guftûgo, agahî û nûçeyên adaptekirî yên li ser mijarên nas û kurt fam dike û dikare xulaseyek hêsan ji naveroka sereke derxîne û detayên girîng şîrove bike.</p> <p>Şagirt peyama û direktîfên devkî yên hêsan û kurt ku di jîyana rojane de rûdidin fam dike û bi awayek bikêrhatî li gor wan tevdigere.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanîne yên ji bo C û beşek mezin ji A tîne çî.</p>	<p>Şagirt bûyer, guftûgo, agahî û nûçeyên adaptekirî yên li ser mijarên nas û kurt fam dike û dikare xulaseyek hêsan ji naveroka sereke derxîne, detayên girîng û hin nuansan şîrove bike.</p> <p>Şagirt peyama û direktîfên devkî yên hêsan û kurt ku di jîyana rojane de rûdidin fam dike û bi awayek baş li gor wan tevdigere.</p>

Kurs C

Şagirt axavtinên zelal û hêsan yên di rewşên asayî di jîyana rojane, kar û civakê de fam dike.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt bûyer, vegotin guftûgo, agahî û nûçeyên kurt yên li ser mijarên nas ku pir tîn tekrarkirin fam dike û dikare xulaseyek hêsan ji naveroka sereke derxîne.</p> <p>Şagirt peyam û direktîfên devkî yên hêsan û zelal ku di jîyana rojane de rûdidin fam dike û piranîya caran bi awayek bikêrhatî li gor wan tevdigere.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanînê yên ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.</p>	<p>Şagirt bûyer, vegotin guftûgo, agahî û nûçeyên kurt yên li ser mijarên nas ku pir tîn tekrarkirin fam dike û dikare xulaseyek hêsan ji naveroka sereke derxîne û detayên girîng şîrove bike.</p> <p>Şagirt peyam û direktîfên devkî yên hêsan û zelal ku di jîyana rojane de rûdidin fam dike û bi awayek bikêrhatî li gor wan tevdigere.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanînê yên ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.</p>	<p>Şagirt bûyer, vegotin guftûgo, agahî û nûçeyên kurt yên li ser mijarên nas ku pir tîn tekrarkirin fam dike û dikare xulaseyek hêsan ji naveroka sereke derxîne, detayên girîng û hin nuansan şîrove bike.</p> <p>Şagirt peyam û direktîfên devkî yên hêsan û zelal ku di jîyana rojane de rûdidin fam dike û bi awayek baş li gor wan tevdigere.</p>

Kurs D

Şagirt axavtinên zelal û hêsan yên di rewşên neresmî û resmî di jîyana rojane, kar, civak û perwerdeyê de fam dike.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt serpêhatî, vegotin, guftûgo, sohbet, agahî û nûçeyên li ser mijarên nas fam dike û dikare xulaseyan ji naveroka sereke derxîne.</p> <p>Şagirt direktîfên bi detay û zelal yên devkî fam dike û piranîya caran bi awayek bikêrhatî li gor wan tevdigere.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanînê yên ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.</p>	<p>Şagirt serpêhatî, vegotin, guftûgo, sohbet, agahî û nûçeyên li ser mijarên nas fam dike û dikare xulaseyan ji naveroka sereke derxîne û detayên girîng şîrove bike.</p> <p>Şagirt direktîfên bi detay û zelal yên devkî fam dike û bi awayek bikêrhatî li gor wan tevdigere.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanînê yên ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.</p>	<p>Şagirt serpêhatî, vegotin, guftûgo, sohbet, agahî û nûçeyên li ser mijarên nas fam dike û dikare xulaseyan ji naveroka sereke derxîne, detayên girîng û hin nuansan şîrove bike.</p> <p>Şagirt direktîfên bi detay û zelal yên devkî fam dike û bi awayek baş li gor wan tevdigere.</p>

Şertên zanîne

Famkirna xwendîne

Kurs A

Şagirt dikane agahiyên hêsan û zelal ji rewşên jîyana rojane yê berbiçav peyda bike, bixwîne û jê fam bike.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt agahiyên di şeweyê gotin, nîşanên asayî û frazên gelek hêsan de peyda dike û fam dike.</p> <p>Şagird nivîsên guncandî û gelekî hêsan yê li ser mijareke nas dixwîne û fam dike.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.</p>	<p>Şagirt agahiyên di şeweyê gotin, nîşanên asayî û biwêjên hêsan de peyda dike û fam dike.</p> <p>Şagird nivîsên guncandî û hêsan yê li ser mijareke nas dixwîne û fam dike.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.</p>	<p>Şagirt agahiyên di şeweyê gotin, nîşanên asayî, biwêj û hevokên hêsan de peyda dike û fam dike.</p> <p>Şagird nivîsên kurt û hêsan yê li ser mijareke nas dixwîne û fam dike.</p>

Kurs B

Şagirt dikane nivîsên hêsan ku di rewşên nas yê jîyana rojane de peyda dibin bixwîne, fam bike û bikar bîne.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt nivîsên adaptekirî yê saloxdanê û tarîfkirinê derbarê mijarên nas de dikare bixwîne, fam bike û xulaseyên hêsan ji naveroka sereke derxîne.</p> <p>Şagirt peyamên şexsî, agahiyên rasterast, direktîfên hêsan, kurt û zelal fam dike û piraniya caran bi awayek bikêrhatî li gor wan tevdigere.</p> <p>Şagirt stratejiyên xwendîne hildibijêre û piraniya caran bi awayek bikêrhatî wan bikar tîne.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.</p>	<p>Şagirt nivîsên adaptekirî yê saloxdanê û tarîfkirinê derbarê mijarên nas de dikare bixwîne, fam bike û xulaseyên hêsan ji naveroka sereke derxîne û detayên girîng şîrove bike.</p> <p>Şagirt peyamên şexsî, agahiyên rasterast, direktîfên hêsan, kurt û zelal fam dike û bi awayek bikêrhatî li gor wan tevdigere.</p> <p>Şagirt stratejiyên xwendîne hildibijêre û di çarçova armancê de bikar tîne.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.</p>	<p>Şagirt nivîsên adaptekirî yê saloxdanê û tarîfkirinê derbarê mijarên nas de dikare bixwîne, fam bike û xulaseyên hêsan ji naveroka sereke derxîne, detayên girîng û hin nuansan şîrove bike.</p> <p>Şagirt peyamên şexsî, agahiyên rasterast, direktîfên hêsan, kurt û zelal fam dike û bi awayek baş li gor wan tevdigere.</p> <p>Şagirt stratejiyên xwendîne hildibijêre û di çarçova armancê de û bitesîr bikar tîne.</p>

Kurs C

Şagirt dikane nivîsên hêsan û asayî ku di jîyana rojane, civak û kar de tene pêş bixwîne, fam bike û bikar bîne.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt nivîsên kurt yê saloxdanê û tarîfkirinê derbarê mijarên nas de dikare bixwîne, fam bike û xulaseyên hêsan ji naveroka sereke derxîne.</p> <p>Şagirt agahiyên taybet yê hêsan ji nivîs, tablo û diyagramên ser fakta peyda dike û derbarê agahiyên de mînaqêşeyên hêsan dike.</p> <p>Şagirt direktîf û peyrewnameyên kurt û zelal fam dike û piraniya caran bi awayek li gor wan tev digere.</p> <p>Şagirt piraniya caran bi awayek bikêrhatî û bi armanca xwendinê stratejiyên xwendinê hildibijêre û bikar tîne.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanînê yê ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.</p>	<p>Şagirt nivîsên kurt yê saloxdanê û tarîfkirinê derbarê mijarên nas de dikare bixwîne, fam bike û xulaseyên hêsan ji naveroka sereke derxîne û detayên girîng şîrove bike.</p> <p>Şagirt agahiyên taybet yê hêsan ji nivîs, tablo û diyagramên ser fakta peyda dike û derbarê agahiyên de mînaqêşeyên pêşketî dike.</p> <p>Şagirt direktîf û peyrewnameyên kurt û zelal fam dike û bi awayek bikêrhatî li gor wan tev digere.</p> <p>Şagirt di çarçova armanca xwendinê de stratejiyên xwendinê hildibijêre û bikar tîne.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanînê yê ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.</p>	<p>Şagirt nivîsên kurt yê saloxdanê û tarîfkirinê derbarê mijarên nas de dikare bixwîne, fam bike û xulaseyên hêsan ji naveroka sereke derxîne, detayên girîng û hin nuansan şîrove bike.</p> <p>Şagirt agahiyên taybet yê hêsan ji nivîs, tablo û diyagramên ser fakta peyda dike û derbarê agahiyên de mînaqêşeyên têr pêşketî dike.</p> <p>Şagirt direktîf û peyrewnameyên kurt û zelal fam dike û bi awayek baş li gor wan tev digere.</p> <p>Şagirt di çarçova armanca xwendinê de û bitesîr stratejiyên xwendinê hildibijêre û bikar tîne.</p>

Kurs D

Şagirt dikane nivîsên hêsan yên bi heta radeyekê naverokê dagirtî ji jîyana rojane, civak, perwerdeyî û kar bixwîne, fam bike û bikar bîne.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt nivîsên saloxdan, tarîfkirin û delîl nîşander yên derbarê mijarên nas de dikare bixwîne, fam bike û xulaseyên hêsan ji naveroka sereke derxîne.</p> <p>Şagirt agahiyên taybet yên hêsan ji nivîsên ser fakta peyda dike û derbarê agahîyan de mînaqêşe û debatên hêsan dike.</p> <p>Şagirt dîrektîf û peyrewnameyên zelal fam dike û piraniya caran bi awayek bikêrhatî li gor wan tev digere.</p> <p>Şagirt piraniya caran bi awayek bikêrhatî û bi armanca xwendinê stratejîyên xwendinê hildibijêre û bikar tîne.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanînê yên ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.</p>	<p>Şagirt nivîsên saloxdan, tarîfkirin û delîl nîşander yên derbarê mijarên nas de dikare bixwîne, fam bike û xulaseyên hêsan ji naveroka sereke derxîne û detayên girîng şîrove bike.</p> <p>Şagirt agahiyên taybet yên hêsan ji nivîsên ser fakta peyda dike û derbarê agahîyan de mînaqêşe û debatên pêşketî dike.</p> <p>Şagirt dîrektîf û peyrewnameyên zelal fam dike û bi awayek bikêrhatî li gor wan tev digere.</p> <p>Şagirt di çarçova armanca xwendinê de stratejîyên xwendinê hildibijêre û bikar tîne.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanînê yên ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.</p>	<p>Şagirt nivîsên saloxdan, tarîfkirin û delîl nîşander yên derbarê mijarên nas de dikare bixwîne, fam bike û xulaseyên hêsan ji naveroka sereke derxîne, detayên girîng û hin nuansan şîrove bike.</p> <p>Şagirt agahiyên taybet yên hêsan ji nivîsên ser fakta peyda dike û derbarê agahîyan de mînaqêşe û debatên têr pêşketî dike.</p> <p>Şagirt dîrektîf û peyrewnameyên zelal fam dike û bi awayek baş bikêrhatî li gor wan tev digere.</p> <p>Şagirt di çarçova armanca xwendinê de û bitesîr stratejîyên xwendinê hildibijêre û bikar tîne.</p>

Şertên zanîne

Danûstandina devkî

Kurs A

Şagirt dikane têkiliyên civakî deyne û bi hin alîkarî di rewşên rojane û rasterast de danûstandinan bike.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt beşdarî sohbetên pir hêsan yê rojane dibe, gotin, silav, rêzdarî û xatirxwestinên hêsan bikar tîne pirs û bersivên rasterast yê pêwsîst dike.</p> <p>Şagirt piraniya caran bi awayek bikêrhatî tevger, pirs û stratejîyên din hildibijêre da ku fam bike û xwe bide famkirin.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.</p>	<p>Şagirt beşdarî sohbetên pir hêsan yê rojane dibe, gotin û biwêjên asayî bikar tîne, pirs û bersivên hêsan û rasterast yê pêwîst dike.</p> <p>Şagirt di çarçova armancê de tevger, pirs û stratejîyên din hildibijêre da ku fam bike û xwe bide famkirin.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.</p>	<p>Şagirt beşdarî sohbetên pir hêsan yê rojane dibe, gotin, biwêj û hevokên asayî bikar tîne, pirs û bersivên hêsan û rasterast yê pêwîst dike.</p> <p>Şagirt di çarçova armancê de û bitesîr tevger, pirs û stratejîyên din hildibijêre da ku fam bike û xwe bide famkirin.</p>

Kurs B

Şagirt bi alîkarî dikane di rewşên asayî yê jîyana rojane de danûstandinan bike.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt beşdarî sohbetên hêsan yê li ser mijarên nas dibe, îdiayan dike û reaksiyonan li ser îdia, hizir û daxwazan nîşan dide. Pirsan û bersivên ku sohbetê heta radeyekê zindî dihêlin dike.</p> <p>Şagirt piraniya caran bi awayek bikêrhatî stratejîyan hildibijêre da ku fam bike û xwe bide famkirin.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.</p>	<p>Şagirt beşdarî sohbetên hêsan yê li ser mijarên nas dibe, îdiayan dike û reaksiyonan li ser îdia, hizir û daxwazan nîşan dide. Pirsan û bersivên ku sohbetê nisbeten baş zindî dihêlin dike.</p> <p>Şagirt di çarçova armancê de stratejîyan hildibijêre da ku fam bike û xwe bide famkirin.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.</p>	<p>Şagirt beşdarî sohbetên hêsan yê li ser mijarên nas dibe, îdiayan dike û reaksiyonan li ser îdia, hizir û daxwazan nîşan dide. Pirsan û bersivên ku sohbetê baş zindî dihêlin dike.</p> <p>Şagirt di çarçova armancê de û bitesîr stratejîyan hildibijêre da ku fam bike û xwe bide famkirin.</p>

Kurs C

Şagirt piştî adaptekirina armancê û aliyê têkildar bi zimanekî hêsan dikane di rewşên asayî yên jîyana rojane, civakî, perwerdeyî û kar de pêwendiyê deyne.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt beşdarî sohbet û gotûbêjên hêsan yên li ser mijarên nas dibe, îdiayan dike û li îdia, hizir û daxwazan digere. Pirsan û bersivên ku sohbet û gotûbêjan heta radeyekê zindî dihêlin û pêş de dibin dike.</p> <p>Şagirt piraniya caran bi awayek bikêrhatî stratejiyan hildibijêre û bikar tîne da ku pêşîya danûstandinan veke.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanîne yên ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.</p>	<p>Şagirt beşdarî sohbet û gotûbêjên hêsan yên li ser mijarên nas dibe, îdiayan dike û li îdia, hizir û daxwazan digere. Pirsan û bersivên ku sohbet û gotûbêjan pêş de dibin dike.</p> <p>Şagirt di çarçova armancê de stratejiyan hildibijêre û bikar tîne da ku pêşîya danûstandinan veke.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanîne yên ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.</p>	<p>Şagirt beşdarî sohbet û gotûbêjên hêsan yên li ser mijarên nas dibe, îdiayan dike û li îdia, hizir û daxwazan digere. Pirsan û bersivên ku sohbet û gotûbêjan pêş de dibin û berfireh dikin dike.</p> <p>Şagirt di çarçova armancê de û bitesîr stratejiyan hildibijêre û bikar tîne da ku pêşîya danûstandinan veke.</p>

Kurs D

Şagirt piştî adaptekirina armanc û aliyê têkildar bi zimanekî hêsan dikare hem di rewşên fermî, hem nefermî yên jîyana rojane, civakî, perwerdeyî û kar de pêwendiyê deyne.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt beşdarî sohbet û gotûbêjên li ser mijarên nas dibe, fikran bi argumentên hêsan dide pêş û pêşwazî dike. Fikr û agahiyên ku heta radeyekê sohbetê pêş de dibin pêşkêş dike û werdigire.</p> <p>Şagirt piraniya caran bi awayek bikêrhatî stratejiyan hildibijêre û bikar tîne da ku pirsgerêkên danûstandinan çareser bike.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanîne yên ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.</p>	<p>Şagirt beşdarî sohbet û gotûbêjên li ser mijarên nas dibe, fikran bi argumentên pêşketî dide pêş û pêşwazî dike. Fikr û agahiyên sohbetê pêş de dibin pêşkêş dike û werdigire.</p> <p>Şagirt di çarçova armancê de stratejiyan hildibijêre û bikar tîne da ku pirsgerêkên danûstandinan çareser bike.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanîne yên ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.</p>	<p>Şagirt beşdarî sohbet û gotûbêjên li ser mijarên nas dibe, fikran bi argumentên baş pêşketî dide pêş û pêşwazî dike. Fikr û agahiyên sohbetê pêş de dibin û berfireh dikin pêşkêş dike û werdigire.</p> <p>Şagirt di çarçova armancê de û bitesîr stratejiyan hildibijêre û bikar tîne da ku pirsgerêkên danûstandinan çareser bike.</p>

Xweîfadekirina devkî

Kurs A

Şagirt bi alîkarî dikane têkilî deyne û bi zimaneke hêsan behsa hin serpêhatîyên xwe bike.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
Şagirt bi gotinên asayî û biwêjên hêsan behsa rewş û tecrûbeyên şexsî dike. Şagirt piraniya caran bi awayek bikêrhatî stratejiyan hildibijêre û bikar tîne da ku xwe bide famkirin.	Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanîne yên ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.	Şagirt bi gotin û biwêjên asayî behsa rewş û tecrûbeyên şexsî dike. Şagirt di çarçoveya armancê de stratejiyan hildibijêre û bikar tîne da ku xwe bide famkirin.	Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanîne yên ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.	Şagirt bi gotin û biwêjên hevger behsa rewş û tecrûbeyên şexsî dike. Şagirt di çarçoveya armancê de û bitesîr stratejiyan hildibijêre û bikar tîne da ku xwe bide famkirin.

Kurs B

Şagirt bi alîkarî dikane têkilî deyne û bi zimaneke hêsan û desteka îşaretan behsa rewşên asayî yên jîyana rojane bike.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
Şagirt bi awayek hêsan behsa tecrûbeyên şexsî, kesê, cî û bûyerên nas dike. Axavtina şagirt fêhbar e û heta radeyekê hevgerî ye. Şagirt piraniya caran bi awayek bikêrhatî ji bo ku bê famkirin çend stratejiyan hildibijêre.	Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanîne yên ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.	Şagirt bi awayek pêşketî behsa tecrûbeyên şexsî, kesê, cî û bûyerên nas dike. Axavtina şagirt nisbeten zelal e û heta radeyekê hevgerî ye. Şagirt di çarçoveya armancê de ji bo ku bê famkirin çend stratejiyan hildibijêre.	Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanîne yên ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.	Şagirt bi awayek baş pêşketî behsa tecrûbeyên şexsî, kesê, cî û bûyerên nas dike. Axavtina şagirt zelal e û baş hevgerî ye. Şagirt di çarçoveya armancê de û bitesîr ji bo ku bê famkirin çend stratejiyan hildibijêre.

Kurs C

Şagirt piştî guncandina li gor armanc û wergir dikane bi zimanekî hêsan di rewşên asayî yê rojane, civakî, perwerdeyî û kar de têkilîyê deyne.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt bi awayek hêsan li ser bûyerên di rojevê de, tecrûbe, întiba û nêrînan diaxive, rave dike, pêşnîyaz û şîretan dike.</p> <p>Şagirt heta radeyekê bi rihetî û heta radeyekê hevgirtî xwe îfade dike û hin varyasyonên zimanî bikar tîne.</p> <p>Şagirt ji bo ku danûstandinê baştir bike, piraniya caran bi awayek bikêrhatî stratejîyên cuda hildibijêre û bikar tîne.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanînê yê ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.</p>	<p>Şagirt bi awayek pêşketî li ser bûyerên di rojevê de, tecrûbe, întiba û nêrînan diaxive, rave dike, pêşnîyaz û şîretan dike.</p> <p>Şagirt nisbeten baş bi rihetî û hevgirtî xwe îfade dike û têr varyasyonên zimanî bikar tîne.</p> <p>Şagirt ji bo ku danûstandinê baştir bike, di çarçova armancê de stratejîyên cuda hildibijêre û bikar tîne.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanînê yê ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.</p>	<p>Şagirt bi awayek baş pêşketî li ser bûyerên di rojevê de, tecrûbe, întiba û nêrînan diaxive, rave dike, pêşnîyaz û şîretan dike.</p> <p>Şagirt baş bi rihetî û baş hevgirtî xwe îfade dike û varyasyonên zimanî qenc bikar tîne.</p> <p>Şagirt ji bo danûstandinê baştir bike di çarçova armancê de û bitesîr stratejîyên cuda hildibijêre û bikar tîne.</p>

Kurs D

Şagirt piştî guncandina li gor armanc û wergir dikane bi zimanekî hêsan di rewşên asayî yên rojane, civakî, perwerdeyî û kar de têkilîyê deyne.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt bi awayek hêsan behs û saloxdana tecrûbeyên şexsî û mijarên nas dike. Ew herwiha pêşniyaz û talîmatên hêsan dide.</p> <p>Şagirt bi awayek fêhbar û heta radeyekê hevgirtî xwe îfade dike û nîşan dide ku dikare hin varyasyonan di ziman de bikar bîne.</p> <p>Şagirt ji bo ku danûstandinê baştir bike, piraniya caran bi awayek bikêrhatî stratejiyên cuda hildibijêre û bikar tîne.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.</p>	<p>Şagirt bi awayek pêşketî behs û saloxdana tecrûbeyên şexsî û mijarên nas dike. Ew herwiha pêşniyaz û talîmatên hêsan dide.</p> <p>Şagirt bi awayek nisbeten zelal xwe îfade dike û nîşan dide ku dikare têra xwe baş varyasyonan di ziman de bikar bîne.</p> <p>Şagirt ji bo ku danûstandinê baştir bike, di çarçova armancê de stratejiyên cuda hildibijêre û bikar tîne.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.</p>	<p>Şagirt bi awayek baş pêşketî behs û saloxdana tecrûbeyên şexsî û mijarên nas dike. Ew herwiha pêşniyaz û talîmatên hêsan dide.</p> <p>Şagirt bi awayek zelal û baş hevgirtî xwe îfade dike û nîşan dide ku dikare baş varyasyonan di ziman de bikar bîne.</p> <p>Şagirt ji bo ku danûstandinê baştir bike, di çarçova armancê de û bitesîr stratejiyên cuda hildibijêre û bikar tîne.</p>

Şertên zanîne

Zanebûnên nivîskî

Kurs A

Şagirt dikane di hin rewşên rojane de nivîs bigre dest.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt di hîn rewşên rojane de agahiyên şexsî bi peyv û sembolên hêsan dinivîsîne.</p> <p>Şagirt piraniya caran bi awayek bikêrhatî agahiyên girîng li gor pêwistiyên şexsî dinivîse.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.</p>	<p>Şagirt di hîn rewşên rojane de agahiyên şexsî bi peyv, sembol û frazên hêsan dinivîsîne.</p> <p>Şagirt bi awayek bikêrhatî agahiyên girîng li gor pêwistiyên şexsî dinivîse.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.</p>	<p>Şagirt di hîn rewşên rojane de agahiyên şexsî bi peyv, sembol û frazên hêsan dinivîsîne.</p> <p>Şagirt bi awayek baş bikêrhatî agahiyên girîng li gor pêwistiyên şexsî dinivîse.</p>

Kurs B

Şagirt dikane çend nivîsên hêsan ku di rewşên asayî yê jîyana rojane de rûdîdin binivîse.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt peyama, silav û nivîsên hêsan li ser xwe û bûyerên ku rûdane bi zimanek fêhmbar û bi kurtî dinivîse.</p> <p>Şagirt piraniya caran bi awayek bikêrhatî hevokan dinivîse.</p> <p>Şagirt piraniya caran bi awayek bikêrhatî stratejîyên cuda yê nivîsandinê hildibijêre û bikar tîne.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.</p>	<p>Şagirt peyama, silav û nivîsên hêsan li ser xwe û bûyerên ku rûdane bi zimanek heta radeyekê zelal û bi kurtî dinivîse.</p> <p>Şagirt heta radeyekê bi awayek bikêrhatî hevokan dinivîse.</p> <p>Şagirt di çarçova armancê de stratejîyên cuda yê nivîsandinê hildibijêre û bikar tîne.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.</p>	<p>Şagirt peyama, silav û nivîsên hêsan li ser xwe û bûyerên ku rûdane bi zimanek zelal û bi kurtî dinivîse.</p> <p>Şagirt bi awayek baş bikêrhatî hevokan dinivîse.</p> <p>Şagirt di çarçova armancê de û bitesîr stratejîyên cuda yê nivîsandinê hildibijêre û bikar tîne.</p>

Kurs C

Şagirt bi hin guncandinan li gor armanc û wergir dikane di rewşên asayî yê jîyana rojane, civak, perwerdeyî û kar de tekstên hêsan binivîse.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt nivîsên hevgerî û fêhmbar li ser tecrûbe, întiba û nêrînan dinivîse. Ew herwiha nivîsên faktayî li ser mijarên nas dinivîse.</p> <p>Şagirt piraniya caran bi awayek bikêrhatî strukturekê ava dîke û di xezîneya gotinan û avakirina hevokan de hin varyasyonê nîşan dide.</p> <p>Şagirt piraniya caran bi awayek bikêrhatî stratejîyên cuda yê nivîsandinê hildibijêre û bikar tîne.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.</p>	<p>Şagirt nivîsên hevgerî û heta radeyekê zelal li ser tecrûbe, întiba û nêrînan dinivîse. Ew herwiha nivîsên faktayî li ser mijarên nas dinivîse.</p> <p>Şagirt struktureke bikêrhatî avadîke û di xezîneya gotinan û avakirina hevokan de varyasyonê heta radeyekê baş nîşan dide.</p> <p>Şagirt di çarçova armancê de stratejîyên cuda yê nivîsandinê hildibijêre û bikar tîne.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.</p>	<p>Şagirt nivîsên hevgerî û zelal li ser tecrûbe, întiba û nêrînan dinivîse. Ew herwiha nivîsên faktayî li ser mijarên nas dinivîse.</p> <p>Şagirt bi awayek baş bikêrhatî strukturekê avadîke û di xezîneya gotinan û avakirina hevokan de varyasyonê baş nîşan dide.</p> <p>Şagirt di çarçova armancê de û bitesîr stratejîyên cuda yê nivîsandinê hildibijêre û bikar tîne.</p>

Kurs D

Şagirt dikane bi hin guncandinan li gor armanc û wergir tekstên hêsan binivîse, ji bo ku hem di rewşên fermî hem nefermî yê jîyana rojane, civakî, perwerdeyî û kar de têkiliyê deyne.

Nota E	Nota D	Nota C	Nota B	Nota A
<p>Şagirt bi awayekî heta radeyekê herikbar tekstên ravekirî, îzahkirî û bi argument derbarê mijarên nas de dinivîse.</p> <p>Şagirt struktureke piraniya caran bi awayek bikêrhatî di nivîsên xwe de ava dike û heta radeyekê varyasyoneke xezîneya gotinan û avakirina hevokan nîşan dide.</p> <p>Şagirt di nivîsên xwe de heta radeyekê ji xwe bawer strukturek rêzimanî ya hêsan û pêşketî ava dike.</p> <p>Şagirt piraniya caran bi awayek bikêrhatî ji bo nivîsên xwe nota digre û wan pev digihîne.</p> <p>Şagirt piraniya caran bi awayek bikêrhatî stratejîyên cuda yê nivîsandinê hildibijêre û bikar tîne.</p>	<p>Nota D tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo E û beşek mezin ji C tîne cî.</p>	<p>Şagirt bi awayekî nisbeten baş herikbar tekstên ravekirî, îzahkirî û bi argument derbarê mijarên nas de dinivîse.</p> <p>Şagirt struktureke bikêrhatî di nivîsên xwe de ava dike û li gor rewşê varyasyoneke baş xezîneya gotinan û avakirina hevokan nîşan dide.</p> <p>Şagirt di nivîsên xwe de nisbeten baş ji xwe bawer strukturek rêzimanî ya hêsan û pêşketî ava dike.</p> <p>Şagirt bi awayek bikêrhatî ji bo nivîsên xwe nota digre û wan pev digihîne.</p> <p>Şagirt di çarçova armancê de stratejîyên cuda yê nivîsandinê hildibijêre û bikar tîne.</p>	<p>Nota B tê wateya ku şagirt şertên zanîne yê ji bo C û beşek mezin ji A tîne cî.</p>	<p>Şagirt bi awayekî baş herikbar tekstên ravekirî, îzahkirî û bi argument derbarê mijarên nas de dinivîse.</p> <p>Şagirt struktureke baş bikêrhatî di nivîsên xwe de ava dike û varyasyoneke baş xezîneya gotinan û avakirina hevokan nîşan dide.</p> <p>Şagirt di nivîsên xwe de baş ji xwe bawer strukturek rêzimanî ya hêsan û pêşketî ava dike.</p> <p>Şagirt baş bikêrhatî ji bo nivîsên xwe nota digre û wan pev digihîne.</p> <p>Şagirt di çarçova armancê de û bitesîr stratejîyên cuda yê nivîsandinê hildibijêre û bikar tîne.</p>

Skolverket

Swedish National Agency for Education
www.skolverket.se